Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1215 23-Cotmeh-2024 www.ronahi.net/ku/

**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Çand bi fêrkirina zarokan derbasî nifşan dibe



**Nujîn Şen a 8 salî ku du sal in beşdarî koma govendê bûye û dixwaze xwe fêrî ensturmana tembûrê jî bike, qala hezkirina xwe ya çanda xwe dike û dibêje ku ew dixwaze bibe mamosteyek xurt.**

Li cîhanê her civak xwedî çand û hunerek cuda ye û bi çand û hunera xwe tê nasîn. Çanda gelê Kurd çandeke dewlemend e. Govend beşeke girîng a çanda Kurdî ye û hestên mirovan derdixe holê. Hem kesên ku dilîzin û hem jî yên temaşe dikin kêfxweşiyek mezin jê distînin. Çanda gelê Kurd ji gotina stranan bigre heta dengbêjiyê ji amûrên mûzîkê bigre heta govendê xwedî gelek rengan e. Dema em li dîrokê dinêrin, dibînin ku çand û huner bi destên jinan bi pêş ketiye. Çand û huner bi destên jinan heta roja me ya îro hatiye û bi fêrkirina zarokan derbasî nişfan bûye.

Yek ji cihên ku herî zêde çand û hunera Kurdî lê zindî ye, Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) e. Dema ku mirov di kolanên wargehê de derbas dibe, komên zarokan ên li hev kom bûne, stran distrên an jî govendê digerînin dibîne. Bi taybetî jî di hemû şahî û pîrozbahiyan de çand û hunera Kurdî bi awayekî herî şênber xuya dibe. Ji komên govendê yên dayikan bigre heta komên govendê yên zarokan, dîmenek bi kelecan derdikeve holê. Zarokên biçûk ên di komên govendê de cih digrin, bi çoş û kêrhatiyên xwe mirovan mest dikin. Yek ji kesên ku bi govenda xwe mirovan mest dike zaroka 8 salî ya bi navê Nûjîn e.

Nûjin Şen a 8 salî ya li Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) dijî, bi liv û tevgera xwe ya li ser dike, di nava wargehê de tê naskirin. Dema ku Nûjîn li ser dikê govendê digerîne, temaşevan bi kêfxweşî û kelacan lê temaşe dikin. Nûjîn bi temaşevanan re heyraniyê ava dike û çavên hemû kesan li ser Nûjînê ne.

Nûjîna ku di temenê xwe yê 5 salî de cara ewil di pîrozbahiyên 4'ê Nîsanê, rojbûna Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de di pêşbirka govendê ya navbera dibistanan de wek surprîza koma govendê ya dibistana xwe derket ser dikê. Di 6 saliya xwe de dest bi rêwîtiya xwe ya govend gerandinê kir û ji vê demê heta niha weke bin govendî di komên govandan de cih digre. Dema ku me xwest ji bo rêwîtiya destpêkirina govendê biçin gel Nûjîn, wê bi kêfxweşiyek mezin me pêşwazî kir. Kêfxweşî û kelecana Nûjînê, di çavên wê de diyar dibû. Dema ku me kameraya xwe ya vekirî Nûjina ku di Navenda Stêra Zêrîn de cih digre, xwest bi stranek me pêşwazî bike. Piştî bidawîbûna strana xwe, dest bi vegotina destpêkirina rêwîtiya xwe ya govendê kir û got: "Min cara destpêkê di 5 saliya xwe de di koma govendê ya dibistana xwe de weke suprîz derketim ser dikê û di 6 saliya xwe de min dest bi govendê kir. Dema ku xwişka min di govendê de cih girt, min jî xwest wek xwişka xwe cih bigrim. Ez cihê xwe hem li binê govendê û hem jî di nîva govendê de cih digrim."

**'Ez gelek ji gerandina govendê hez dikim'**

Nûjîn, diyar kir piştî mamosteyên wê daxwaz kirine beşdarî koma govendê bûye û wiha qala xwe kir: "Rojek mamosteya me hat û got ku yên dixwazin di govendê de cih bigrin bila navê xwe binivîsînin. Yên ku xweş dilîstin berdewam kirin û yên ku nikaribûn ji wan re digotin xwe ji bo saleke din amade bikin. Min di Navenda Stêra Zêrîn de xwe fêrî govend û erbaneyê kir û dixwazim salek din fêrî sazê bibim. Govend ji bo min gelek xweş e, ez gelek hez ji gerandina govendê dikim." Nûjîna biçûk, di kêliyên ku diaxivî de navber da û xwest stranek bibêje û strana xwe diyarî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan kir. Nûjîn, herî dawî diyar kir ku dixwaze dema mezin bibe, bibe mamosteyek xurt. **NÛ JINHA**

# Dilsoz Resûl bi tabloyên xwe êşa Kurdan û zehmetiyên jinan nîşan dide

**Navenda Nûçeyan**



Jina şêwekar Dilsoz Resûl bi firçeya di destên xwe de êşa Kurdan û zehmetiyên jinan dixe tablo û nîşan dide. Dilsoz got: "Ez ti demê bêhêvîtî li jiyanê temaşe nakim, hêviyê didim jinan û hertim zemînek ji bo keyfxweşî û heskirinê dihêlim."

Şêwekar Dilsoz Resûlî ji zarokatiya xwe de keyfa wê ji çêkirina wêne û tabloyan re hatiye, li gor wê reng û tablo dikarin peyamek baş bidin mirovan. Ji bo wê ew hertim hewl dide bi rêya xêzkirina wêneyan peyamên cûda yên jinan bigihîne civakê.

Dilsoz Resûl (42) li navçeya Koye hatiye dinê, beşa şêwekarî li Peymangeha Hunerên Ciwan a Silêmaniyê qedandiye û li Silêmaniyê dijî. Heta niha bi wêneyên xwe tevlî 46 pêşangehên hevbeş ên şêwekariyê bûye.

Wek Dilsoz dibêje, ji zarokatî de heskirina wê ji karê çêkirina wêne re hebû û di sala 1990'an de bi çalakiyên li dibistanê tevlî cîhana wênesaziyê bûye. Piştre jî li peymangehê beşa şêwekarî qedandiye û niha jî ew dixwaze bi rêya tabloyan xeyal û cîhana xwe bi awayek hunerî nîşan bide.

Dilsoz Resûl diyarkir ku wê li navxwe û dervey Kurdistanê tablo û wêneyên xwe nîşandaye û heta niha tevlî 46 pêşangehên hevbeş ên şêwekarî bûye.

Di derbarê astengî û zehmetiyên di jiyana wê ya hunerî de derketine jî Dilsoz Resûl got: "Tevî ku li Başûrê Kurdistanê dest bi ser azadiyên jinan de hatiye girtin û bûne asteng ji bo jin bi xwesteka xwe kar bikin, lê min kariye bi piştgiriya malbata xwe hemû astengî û zehmetiyan derbaskim. Ez ti demê bêhêvîtî li jiyanê temaşe nakim, hêviyê didim jinan û hertim zemînek ji bo keyfxweşî û heskirinê dihêlim."

Dilsoz da zanîn ku divê jin astengiyên li pêş xwe rakin, ber bi armanca xwe ve bimeşin, xwezayîbûna xwe biparêzin û wisa bikarin serkeftinê bidestbixin.

Di dawiyê de jî Şêwekar Dilsoz Resûl got: "Ez dixwazim bi hunera xwe nîşanî civaka Kurd bidim ku hêzekin, xwedî kêrhatinên xwe yên taybetin û dikarin li ser lingên xwe bisekinin."

## bi kamîreya Ronahî



Kampa Waşûkanî

## FERHENGA BIWÊJAN

**Di banga xwe de ye:**
- Bi heman wateyê.

**Di heyama xwe de ye:**
- Bi heman wateyê.

**Li ser teng û benga xwe ye:**
- Di ciwaniya xwe de dijî.

**Bayek da xwe:**
- Xwe vedizî; xwe da aliyekî;

**Tew da xwe/tewek da xwe:**
- Bi heman wateyê.

**Çiv da xwe:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER KESÊ RAST NABÊJE; KESÊ LI DERDORA MIJARÊ RE DIÇE Û TÊ**

**Bayek da xwe:**
- Rast negot; di derdora mijarê re çû hat.

**Tew da xwe/tewek da xwe:**
- Bi heman wateyê.

**Çiv da xwe:**
- Bi heman wateyê.

**Bayê wî daket:**
- Quretiya wî jê re nema.

**Ji bayê xwe ket:**
- Bi heman wateyê.

**Guhên wî dapêlî bûn:**
- Bi heman wateyê.

**Serê wî ket berê:**
- Bi heman wateyê.

**Sernixwûn bû:**
- Bi heman wateyê.


Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Pêngav wê heta misogerkirina Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo dewam bike'



Pêngava cîhanî ya "Ji Rêber Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî" saleke dagirtî û dijwar li pey xwe hişt. Menan Cafer diyar kir ku heta misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo wê pêngav bi hemû hêza xwe berdewam be.**R-4**

## 'Pêwîste nifşên nû rêya Cegerxwîn dewam bikin'



Keça helbestvanê kurd yê nemir Cegerxwîn diyar kir ku bavê wê beriya her tiştî mirovekî jîr, zane û zelal bû û got, "Pêwîste nifşên nû li ser şopa Cegerxwîn kar û xebatê dewam bikin."**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1215 23-Cotmeh-2024 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## 'Saziyên navneteweyî ji bo destekdayîna koçberan ne li gorî sozên xwe ne'



Hevserokê Nivîsgeha Karûbarên Koçber û Penaberan, Şêxmûs Ehmed da zanîn ku koçberiya ji Lubnanê ber bi herêmê ve hîna berdewam e. Herwiha Ehmed eşkere kir ku sazî û rêxistinên cîhanî yên mirovî soz û peywendî bi Rêveberiya Xweser re ji bo destekdayîna dan û çêkirin, lê ew ne li gorî sozên xwe derketin.**R-5**

## Koçberiyê hestên zarokatiyê perçiqandin



Dewleta Tirk a dagirker bi dagirkirina wê ji bajarê Serêkaniyê re bû sedema ku gelek zarok ji siberoja xwe dûr bikevin û rastî gelek astengiyan hatin, piraniya wan ji bona debara jiyanê neçar man dev ji dibistanên xwe berdin û bi malbata xwe re alîkariyê bikin.**R-6**

# XETA TÊKBIRINA XIYANETÊ; XETA BÊRÎTAN E

Şehîd Bêrîtan bû ruh, raman, heqîqet û destaneke mayînde. Wê bi eşqa xwe ya ji jiyanê re hêza rasteqîn a jinan a di aliyê rêxistin, şer û jiyanê de nîşan da. Fermandar Bêrîtan bi çalakiya xwe ya fedayî navê xwe di rûpelên dîroka berxwedanê ya gelê kurd de nemir kir û li hemberî xeta xiyanetê, bû bersiv.**R-2**



## Rêkeftina Edeneyê



Di 20'ê Cotmeha 1998'an de di navbera Tirkye û Sûriyê de li dijî Rêber Apo û Tevgera Azadî û destkeftiyên gelê kurd peymanek bi navê "Rêkeftina Edeneyê" hat îmzekirin. Ev rêkeftin bi navbênkariya Misirê di navbera serkêşê îstîxbarata Sûriyê Ednan Bedir Hesen û MÎT'ê de hat îmzekirin.**R-3**

**Jinên dibin qurbanê zayendperestiyê zêdetirî xwe zarok in**
Nehîr pale R-2


**Rê nadin hilbijartin û demokrasî bimeşe!**
Dilyar Cizîrî R-4


**Doza PKK'ê dewam dike**
Farûk Sakik R-5

**Erdogan fêrbûye ku derfeta xirab bi kar bîne**
Zekî Bedran R-5

# Ji mirinê jiyan afirand; Şehîd Bêrîtan

Şehîd Bêrîtan bû ruh, raman, heqîqet û destaneke nemir. Wê bi eşqa xwe ya ji jiyanê re hêza rasteqîn a jinan a di aliyê rêxistin, şer û jiyanê de nîşan da. Fermandar Bêrîtan bi çalakiya xwe ya fedayî navê xwe di rûpelên dîroka berxwedanê ya gelê Kurd de nemir kir.

**Dîlan Mulhim/Qamişlo**



Bêrîtan bi nasnav Gulnaz Karataş, di sala 1971`an li Bogilan ya Çewlîkê ji dayîk bûye. Gulnaz xwendina xwe ya seretayî û navîn û amedayî li Elezîzê dixwend, lewra dibistana ku Gulnaz lê dixwend lîseya Anadolu a El ezîzê bû ku bi mamosteyên nijatperstî û paşvemayî hatibûn dagirtin. Li van saziyan û dibistanan zêdetir zext û empozekirina sîstemê bi awayekî sîstematîk dihatin birêvebirin. Li van deveran zarok ji neteweya wan ji baweriyên wan dihatin dûrxistin. Elezîzê wê demê cihê başverûtî û nijatparastiya Tirkiyê bû.
Gulnaz di sala 1988`an de zanîngeha Stenbolê beşê zanista Aborî qezenc kir. Ewlekariyên ku li Elezîzê bûn piştî derbeya faşîst a 12'ê Îlonê ji ber nasnameya xwe ya olî hîn zêdetir rastê êrîş û çewsandinan dihatin. Ev jî dibe sedema dilsoziya Gulnaz ji Tevgera Azadiya Kurdistanê re ku di temenek ciwan de dest pê dike. Ev navgîna bi nakok û aloz di kesayeta Gulnaz de taybetmendiyê berxwedanê ava dike. Her wiha dema Gulnaz tevlî tevgera azadiyê dibe bi dergistiyê xwe re di sala 1990'î de tevlî nava tevgera azadiya Kurdistanê dibin. Lewra ji bo xebatên rêxistinkirina gel, vedigere Tirkiyê û li Stenbolê dest bi kar dike. Gulnaz fêrî zimanê kurdî dibe û di nav gelê kurde tê hezkirin. Piştî demekê ji xebatên di nava gel de û di heman salê de di encama oprasyonekê li gel hevalê xwe tê girtin. Lê di eşkenceyê de tu tişt li ser xwe nabêje û li berxwe dide û ji ber kêmbûna delîlan demekê di girtîgeha Bayram paşa ya Stenbolê de tê hiştin û piştire tê berdan.

**Bêrîtan bi têkoşîna xwe bû nasnameya jina kurd**

Gulnaz bi têkoşîn û berxwedaniya xwe bû riya azadiya jina kurd, her wiha li hemberî dewleta tirk têkoşîn û berxwedaniyeke pêhempa nîşanda. Gulnaz di sala 1992 yan de û di encama peymaneke di navbera dewleta Tirk û PDK'ê ya bi armanca tunekirina Tevgera Rizgariya Kurdistanê, dewleta Tirk dest bi êrişekî leşkerî li dijî gerîlayên li ser çiyayên Kurdistanê dike. Bi hezaran çekdarên PDK'ê tevlî êrişê dibin, Bêrîtan israr dike ku tevlî bersivdayîna vê êrişê bibe û bû yek ji gerîlayên ku ji bo şikandina êrîşên xayinên ku hevkariya dijmin dikin li ber xwe dide. Bêrîtan hêvî ku li çiyayê lêlîkan a Xakûrê li dijî hêzên nûker şer dike û guleyên wê xilas dibin û ji aliyê pêşmergeyan ve tê dorpêçkirin û dixwazin ew xwe radestî wan bike. Lê Bêrîtan xeta berxwedan û rûmetê dihilbijêre. Her wiha şehîd Bêrîtan 25'ê Cotmeha 1992 'an heta fîşeka xwe ya dawî şer kir ji bo nekeve destê dijmin de xwe ji zinaran avêt. Ev jî dibe ji kevirên bingehîn a artêşbûna jinê û sembola berxwedanê, Bêrîtan felsefeya azadiya jinê, pîvanên jiyanê yên Rêber Apo temsîl kiriye. Îro jî xeta berxwedan, qirkirin û îxanetê li beramberî hev dimeşin û tekez wê xeta berxwedanê serbikeve. Îro jî bi heman rihî li dijî xeta xiyanet û êrîşên dagirkeriyê li dijî teknîka herî pêşketî û çekên kimyewî gerîlayên azadiya Kurdistane pêşengiyê ji tevahî mirovahiyê re dikin.

**Rêber Apo: Bêrîtan xeta jina serhildê re**

Şehîd Bêrîtan beriya ku şehîd bikeve û bi rengekî ji xwe bawer û bi cesaretek mezin dixwast jiyana Rêber Apo di nava romanekê de binivîsîne û ji bona vê yekê ji Rêber Apo re Raporê dinivîse. Dema ku Rêber Apo rapora şehîd Bêrîtan dixwîne, bala wî dikişîne ku Bêrîtan pir şarezaye û ji xwe bawere. Rêbertî ji hevalan pirs dike, gelo ev heval kiye ku dixwaze destana, jiyana min xêz bike, hevalên ku hevala Bêrîtan dinasin ji Rêber Apo re qala kesayet û berxwedana wê ya bêhempa dikin. Rêbertî pir xemgîn dibe ku hevaleke wiha wek Bêrîtan şehîd ketiye. Piştî ku bi detayî bûyera şehadeta heval pirs dike û dinase, wiha dinirxîne û dibêje: Bêrîtan xeta jina serhildê re.

# Pêşeng û Fermandara Artêşa Jinê Bêrîtan Hêvî

**Leyla Weşûkanî**

Bêrîtan xwedawenda şer û bedewiyê, keça Dêrsimê ya wêrek û dilvîn, di rojek wek vê rojê de serê xwe li hemberî xiyanetê hilda û ji ser zinarên Lêlkanê xwe wek bazekî, berda newala kûr. Ji bo ku xiyaneta mala Berzanî vala derxîne, xwe perçe perçe kir û ji xiyanetê re bû ders û îbret, Bêrîtana dilgerm û nazdar xiyanet li ser xwe qebûl nekir û kete rêza jinên Dêrsimê yên serhildêr. Bêrîtan Hêvî her di xwest ku kesayeteke ne ji rêzê be, ji ber vê her di nava hewildanan de bû ku xwedî kesayeteke bi hêz û xwedî vîn be. Dema ku Rêber Apo rapora şehîd Bêrîtan di xwîne, bala wî di kişîne ku hevala Bêrîtan pir şarezaye û ji xwe bawere. Rêbertî ji hevalan pirs dike, gelo ev heval kiye û çawa ku di xwaze destana, jiyana min xêz bike, hevalên ku hevala Bêrîtan di nasin ji, Rêber Apo re qala kesayeta Bêrîtan û berxwedana wê ya bê hempa dikin. Rêbertî pir xemgîn dibe ku hevaleke wiha wek Bêrîtan şehîd ketiye, piştî ku bi detayî bûyera şehadeta heval pirs dike û di nase, wiha di nirxîne û di bêje: Bêrîtan xeta jina serhildê re û helwesta Bêrîtan li hemberê, xiyaneta mala Berzaniye û di heman demê de, li hemberî xeta Ferhad yê ku teslîmiyet li ser xwe qebûl kir û xwe radestî hêzên YNK ê kir. Lê Gulnaz wek Besê û Zerîfeyan teslîmiyet qebûl nekir û sere xwe li himberî xeta KDP hilda û bi wêrekî, xwe ji serê zinarên Xakurkê avêt xwarê û xeta xiyanetê bi bin xist. Rêber Apo ji bo tevgera jin wiha di nirxîne û di bêje, Bêrîtan xeta jinê ya leşgeriye û fermandara gerîla ya serkeftiye, Bêrîtan artêşbûna jinê ye. Ji wê rojê de tevgera jinên Kurdistanê ev roj kiriye roja artêşbûna jinê, yanî 25. 10. 1992. Sal roja avakirina artêşê ye. Yekîneyên Sitar. Bi navê YJA- STAR hatiye saz kirin, dema ku em qala hevala Bêrîtan Hêvî dikin artêşbûna jinê têye bîra mirov û dema ku em qala artêşbûna jinê dikin careke din Bêrîtan û çalakiya xwe ya bê hempa têye bîra mirovan û mirov bi wê çalakiyê serbilind dibe û wê ji xwere nimûne digire dest. Bêrîtan Hêvî (Gulnaz Karataş) keça çalakvan a Dêrsimî, piştî ku partiyê û Rêbertî di bihîze û birdûziya wan qebûl dike, biryara xwe dide û tevî dergistiyê xwe Huseyên têne û beşdarî nava partiyê dibin. Hevala Bêrîtan keçeke pir jîr û zana bû, di esnayê çalakiya xwe ya serhildêrî de sal û nîveke xwe tijî kiribû. Hevala Bêrîtan bi zanebûn beşdarî nava partiyê bibû, Bêrîtan Ferhad Ocalan û emsalên wî baş nas dikir û ji wan bewer ne dikir, Bêrîtan her di nava xwede guman di hewand û di xwest ku bi zanibe bêka çi di navbera, Osman û pêşmergan de diqewime. Ji xwe di dema ku wê heval biçin çalakiyan hevala Bêrîtan li himberî vesaziya ku hevalê Harûn çê kiriye ne razîbûna xwe raber dike û bi îsrar hevalên jin beşdarî çalakiyan dike. Di şerde jî rola xwe pir xûrt dileyize û heyanî nefesa xwe ya dawiyê şer dike û bi qehremantî diçe şehadetê. Hevala Bêrîtan hem di şerde û hem jî di jiyanê de xwedî rol bûye û jiyana xwe ya di sal û nîvekê ya di nava gerîla de tijî derbas dike û ji hemû jinên gerîla re dibe



qûdwe û remza jina azadî xwaz û serhildêr. Em jî hevalên hevala Bêrîtan sere xwe bi berxwedan û çalakiya wê bilind dikin û li ked û mîrasa wê xwedî derdikevin û di rojeke wek vê rojê de, soza xwe jêre nû dikin. Em di bêjin ku emê dagirkeriyê û hevkarên wan yên xiyanetkar bi binbixin û jiyaneke azad ji jin û civakê re ava bikin, emê tola we ji xiyanetkaran rakin. Bi hurmet û minetdarî ez hevala Bêrîtan û di şexsê wê de hemû şehîdên kurdistanê bi bîr tînim û bejna xwe li him berî bîranîna wan di tewînim û soza xwe ji wan re nû dikim. Îro li ser daxwaza şehîd Bêrîtan min ji hevalên dibistanê re helweyeke pir xweş çêkir û min hin heval jî fêrî çêkirina helawê kir, hevala Bêrîtan pir ji helawê hezdikir.

## Ji Pênûsa Jin

**Jinên dibin qurbanê zayendperestiyê zêdetirî xwe zarok in**

Nehîr Pale

Nêrandina civaka zayendperest û rêbazên wê dibin sedema qewmandina gelek pirsgirêkên civakî yên giran. Mînak malbatên ku kurên wan tine ne û tenê keçên wan hene di civaka zayendperest de mîna ku nîvço ne û ji malbatên dîtir kêmtirin, li wan tê nêrandin. Şerekî taybet ê dijwar li ser wan tê meşandin û dikevin bin rehmeta civakê de. Dayîk û keçên xwe wê her tim ji derdora xwe bitirsin û di encama wê de berê xwe bidin rêbazên ku hîn zêdetir bibin esîrê zayendperestiyê.
Dayîkeke 5 keçên wê hene, piştî ku bajarê wan hatiye dagirkirin di navbera wê û hevjînê wê de gelek pirsgirêk derketine. Mêr li ser hevjîna xwe zewiciye û berpirsyartiya keçên xwe ranake. Dayîk jî di hemû şert û mercan de ji pirsgirêkên malbata xwe re nebûye hêza çareseriyê. Civakê ew dayîk xistine rewşeke ku her tim hîs bike keçên wê bûne bela serê wê. Ji ber vê yekê keça xwe ya mezin di temenekî biçûk de dide zewcandin, a pişt wê jî hîna nebûye 16 salî wê dizewicîne. Keça wê ya mezin ku hîna zaroke rastî tûndiyê tê. Ji ber tûndiya zêde zarok ji ber diçin û ew xwe dide berdan. Niha civak dîsa zextê li dayîka wê dike ku wê careke dîtir bide zewcandin. Hîna temenê wê 19 salî ye wê du caran bizewcîn in. Ev yek jî di bin navê starê de tê kirin.
Civaka zayendperest dibe sedema ku keç û jinên ciwan wenda bibin û wan dixin bin barekî giran de. Bi zewacê tu pirsgirêk nayên çareser kirin, di têkiliya jin û mêr de pirsgirkên zîhnî û piskolojîk hene, dayîk dizanin ku mêr çawa nêzî hevjînên xwe dibin, dîse jî çareseriya pirsgirkên xwe di zewacê de dibîn in.
Dayîk çima dighîje asta ku keçên xwe bela bibîne? Çima hewl dide xwe ji wan xilas bike û hîna zarok in wan dizewicîne? Dayîkên ku xwe dixin vê rewşê de ne mumkine ku jiyana xwe rehet derbas bikin, ji ber wê her tim êş dikşînin û wijdanê wan ne rehet e. Ji ber ew bi xwe dibin sedema keçên wan di buyerên giran re derbas bibin.
Ji civakê kesek rehmetê li jinê nake û bi taybet jineke ku wê û hevjînê xwe dev ji hevdû berdabin êdî di çavên civaka zayendperest de kêm tê dîtin. Gelo wê kesek rêz bide wê, yan jî mîna mirovan nêzî wê bibin? Ew di nava civakê de nayên qebûlkirin û her kes zextê li wan dike ku serî tewandin çarenûsa xwe bibîn in. Malbat yê wê du caran, sê caran û çar caran bizewcîne, ya girîng xwe jê xilas bikin û serê wan rehet bibe. Dayîk dibêjin em keçên xwe bizewicînin û serê xwe rehet bikin. Ew difikirin ku eger keçên xwe bizewicînin ew ê ji gotinên xelkê xilas bibin. Piştî ku keçên xwe di temenekî biçûk de dizewicînin, li pey hevdû pirsgirêk bi wan re derdikev in.
Ji xwe bi rêbazên zayendperest pirsgirkên di navbera jin û mêr de tucarî çareser nabin.



# 'Pêwîste nifşên nû rêya Cegerxwîn dewam bikin'

Keça helbestvanê kurd yê nemir Cegerxwîn diyar kir ku bavê wê beriya her tiştî mirovekî jîr, zane û zelal bû û got, "Pêwîste nifşên nû li ser şopa Cegerxwîn kar û xebatê dewam bikin."

**Birûc Resûl/Qamişlo**





Helbestvanê kurd Cegerxwîn navê rast (Şêxmûs), di sala 1903`an de li gundê Hesarê hatiye diniya yê, malbata Cîgerxwîn ji 11 xwîşk û biran pêk dihat, her wiha bavê wî Hesen di sala 1918`an de li bajarê Amûdê û diya wî Eyşan di sala 1919`an de li gundê Bêdir-Memo çûne ser dilovaniya xwe. Cegerxwîn demekê li cem xwîşk û birayê xwe ma.

**Jiyan û xebatên zaniya Cîgerxweîn**

Di sala 1920`an de Cîgerxwîn cû xwendegeha olperestî û çend salan li ser hev li Rojava, Başûr û Rojhilat li xwendinê geriyaye û rewşa gelê Kurdistanê baş nas kir. Di sala 1927`an de bi keça xalê xwe Kehla Selîm re dizewice û li Amûdê bi cî dibin. Di sala 1928`an de xwendina xwe qedandiye û di wê salê de dîwana xwe ya yekemîn nivîsiye. Di sala 1936`an de Cegerxwîn bi çend malên gundiyan re 2 gundên ku navên wan Çêlek û Cehenem bû, ava dikin. Di sala 1937-1938`an de Cegerxwîn û hevalên xwe li bajarê Amûdê ji xortên kurdan re komelekê dadimezirînin, lê komeleya wan ji aliyê Fransizan ve tê girtin.
Di sala 1946´an de Cegerxwîn tê li bajarê Qamişlo bi cih dibe. Di wê salê de Civata Azadî û Yekîtiya Kurd tê avakirin. Dr. Ehmed Nafiz dibe serok û Cegerxwîn jî dibe sekreter.
Di sala 1948`an de Cegerxwîn dibe endamê Partiya Komûnîst a Sûriyê. Di sala 1949`an de cara yekemîn Cegerxwîn tê girtin. Di sala 1950`î de Cegerxwîn dibe endamê Civata Aştîxwazên Sûriyê û di nav wê de kar dike. Di sala 1954`an de Cegerxwîn ji hêla komûnîstan ve dibe namzadê parlamenta Sûriyê. Di sala 1957`an de Cegerxwîn ji komûnîstan dûr dikeve û di wê salê de Cegerxwîn û hevalên wî rêxistina AZADÎ saz dikin û demekê şûnde rêxistina xwe fesih dikin û tev li Partiya Demokratî ya Kurdî dibin.
Di sala 1959´an de Cegerxwîn dirdikeve Îraqê û sê salan li wir li Zanîngeha Bexdayê di Beşa Kurdî de dibe mamosteyê zaravaya kurmancî. Di sala 1962´an de hukûmeta Îraqê Cegerxwîn ji Îraqê dedixin, ew û zarokên xwe vedigerin Sûriyê, Cegerxwîn tê girtin û piştî demekê tê berdan.
Di salên 1963`an û 1973´de di navbera Sûriyê û Iraqê de tê û diçe û gelek caran jî tê girtin û berdan. Di sala 1973`an de diçe Lubnanê û li wir dîwana xwe ya 3`mîn KÎME EZ? û çîroka Salar û Mîdya çap dike. Di sala 1976`an de Cegerxwîn vedigere Sûriyê û heta sala 1979´an li wir dimîne.

**Li Swêdê**

Di sala 1979`an de Cegerxwîn ji Sûriyê direve û diçe Swêdê û 5 salên xwe yên dawî ji jiyana xwe li Swêdê derbas dike. Di 22 Cotmeha 1984`an de li bajarê Stockholmê Cegerxwîn diçe ser dilavaniya xwe. Gora Cegerxwîn li bajarê Qamislo di hewşa xaniyê wî de ye.
Derbarê jiyan û salvegera koça 40`mîn ya Cîgerxweîn, kaça wî Boniya Cîgerxwîn ji Rojnemeya me re axivî.
Boniya Cegerxwîn di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku di malbatê de hemû berhemên ku helbestvan Cegerxwîn dabûne avakirin di asteke mezin de di xizmeta gelê Kurd debûn û wiha got: "Ez di malbateke siyasî û rewşenbîrî de hatim dinê. Em di malbatê de ji 5 xuşk û 2 bira pêk tên, ji xwe keçka mezin beriya demekê çû ser dulovaniya xwe. Di heman demê de birayekî min jî di encama nexweşiya koronayê de jiyana xwe ji dest da. Her wiha di malbatê de hemû berhemên ku zaniyar Cegerxwîn dabûne avakirin di asteke mezin de di xizmeta gelê Kurd de ye, em wekî malbat bi xwe jî her şopdarê riya wî ne, min jî ji berhemên Cegerxwîn gelek sûd girt û dikarî 4 pirtûkan bi zimanê kurdî û erebî binvîsim û çap bikim, bi giranî naveroka pirtûkên min, ji helbest û fêrbûna zarokan pêk tê."

**'Cîgerxwîn mirovekî jîr û zelala bû'**

Boniya palkişand ser kesayeta Cîgerxwîn û wiha got: "Eger em li dîroka bi hêz ya Cegerxwîn binêrin, gelek taybetmedî derdikevin pêşiya me, ji xwe mijara ku hişt Cegerxwîn bibe Cegerxwîn taybetmendiyên wî bûn. Bêguman beriya her tiştî mirovekî jîr û zelala bû, di heman wextî de ji bo hemû derd, pirsgrêk û azaran dibû hêza çareseriyê. Mamoste Cegerxwîn hemû tesbîtên ku beriya 50 salî bi lêv kiribû di roja me ya îro de diqewime, ji xwe di dibistanê de her dem bi kesê zaniyar dihate nasikirin û her kesê ku ew nas dikir jî bi dilekî aram nêzî wî dibûn, her wiha kesên ku Cegerxwîn nas nedikirin jî her bi xeyala ku wî rojek bibînin dijiyan. Ya din jî mirovekî ji zanînê hezdikir û her dem dixwest ku xwedî li pirsgirêk û çanda Kurdî derkeve, ji lewra bi berhemên xwe yên zêrîn karî bû ku pirtûkxaneya kurdî sûdekî mezin bide. Di aliyekî din de jî, dema ku em li dîrokê binerin heya roja me ya îro jî, kurd di serdema koletiyê de jiyan dikirin, dijminên ku li her çar parçên Kurdistanê xwe bi cih kirine nav û dengên Kurdan ji holê rakirbû, ev jî dibû sedemek ku Cegerxwîn bikaribe van danûşiyan bibîne, tesbît bike û hêza zanebûnê derbixe."

**'Eger Kurd ne bin yek, wê biçin yek bi yek'**

Boniya di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Berhemên ku Cegerxwîn bi tîpên xwe yên zêrîn dane avakirin ji bo gelê Kurd bû riyek. Ji ber ku serdema ku mamoste Cegerxwîn jiyan dikir serdema çewsandinê bû gelê Kurd û Kurdistaniyan bû. Bi pêvajoya Cegerxwîn de desthiledarî ango bi sernavekî din wekî nejedparest dewlet zindanên xwe ferhtir kirin û dest bi girtina kesên ku daxwaza mafên Kurdbûnê dikirin. Di heman demê de kesên ku bi ziman û zaravayên Kurdî dixwendin ji hêla dewletê ve dihate bin çavkirin, kesên ku azadiya xwe bi zimanên xwe yên Kurdî didîtin ew jî dihatin winda kirin û gelek kes jî heya roja îro li ser wan tiştek nayê zanîn. Ji lewra banga Cegerxwîn ji bo Kurdan ev bû,' Pêwîst e her kes bi zimanê dayikê bixwîne û siyaset bike'. Her wiha xwasteka wî ya yekîtiyê jî her dem hebû, ji lewra digot 'Eger Kurd ne bin yek, wê biçin yek bi yek'."

**'Pêwîst e mirov wêje û zimanê civaka xwe nasbike'**

Boniya da zanîn ku . Ji bo mirov civakekî xebat û ked bike, pêwîst e beriya her tiştî wêje û zimanê wê civakê nas bike û wiha got: " Cegerxwîn di demekê de jiyan kir ku bindestî bi rengekî ne hesan hebû. Lê kesên ku kar û xebat dikir hebûn yek ji wan Malbata Bedirxaniyan bûn ku ji bo ziman çanda xwe xebat dane meşandin, li hemberî dewletê serê xwe rakirin. Dikarim bi zelalî bînim ziman ku di roja me ya îro de jî gelek xebat yên di derbarê ziman û wêje de hatine bi rêvebirin, lê bes nîne û gelek kême. Ji bo mirov civakekî xebat û ked bike, pêwîst e beriya her tiştî wêje û zimanê wê civakê nas bike. Ji ber ku wêje û zimanê çivakê dîroka wê çivakê ye. Niha dîse hin pirsgrêkên ku em lê rast tên bi taybet di hêla nivîsandina pirtûkan de, Gelek kes hene pirtûksn dinvîsinin û bi xwe ne xwendekarin ango ne xwende ne. Ji lewra dema ku pirtûk tên nivîsandin jî bi awayekî xeyalî ye û kêm rastiya civakê pênase dike. pêwîst e em ji bingeh de bixwînin heya em bighêjin zaningehê. Ev şertekî bivê nevê ye û lazime em li ser bisekinin da ku nifşên siberojê sûd bigrin."

**'Pêwîst e nifşên wekî Cegerxwîn di nava civaka Kurd de derkevin'**

Boniya Cîgerxwîn da xuyakirin ku di dema niha gavek mezin tê avêtin ji hêla zimanê Kurdî de, lê civaka me di aliyekî de bi rêzê nêzî zimanê xwe nabe û wiha got: "Niha ez pirtûkan û helbestan dinvîsênim, di gelek aliyan de li ser pirsgrîka ku Kurd lê derbas dibin dihizirim, ji xwe her kesên ku bêje ez Kurdim pêwîst e ji bo Kurdîtiya xwe xizmet bike û em rê nedin kesek were me bi rêve bibe. Eger rêveberiyek hebe wê rêvberiya civakê bê. Pêwîst e nifşên mezin ji nava Civaka Kurd derkevin ku bikaribin xizmeta civaka xwe bikin. Pêwîst e ku nifşên wekî Cegerxwîn di nava civaka Kurd de derkevin. Di heman demê de em di serdemeke nû de ne, yanî gelek teknîk bi rêve çûye û teknîka herî mezin jî bi destê mirovan hetiye nivîsandin. Ji lewra pêwîstiyekî gelek mezine ku em sûd ji vê teknîkê bigrin û bikin xizmeta civaka Kurd de. Pêwîst e civaka me bixwîne ji ber mijara ku civakê Azad dike zanîne."

**Salvegera koçkirina 40`emîn a zaniyar Cîgerxwîn**

Boniya Cîgerxwîn di dawiya axaftina xwe de salvegera koçkirina zanyar Cîgerxwîn bi bîr anî û wiha got: "Di Cotmehê de bîranîna 40`emîn ya nemir Cegerxwîn e. Ji lewra wekî rêxistin em li hewş ango mala wî bîranînê çêdikin. Bêguman ji bo me jî cihê kêfxweşiyê ye ku her kes were di vê bîranînê de cihê xwe bigire. Di dawiyê de bangewaziya min ew e ku hemû nivîskar û rewşenbîrên kurd destên xwe bikin destê hev de û ji bo pirtûkxaneya Kurdî xebatên mezin bikin. Di heman demê de pêwîst e gelê me jî li hemberî dijminên salan destên xwe bidin hev û dijmin têk bibin."

# Koçberiyê hestên zarokatiyê perçiqandin

**Dewleta Tirk a dagirker bi dagirkirina wê ji bajarê Serêkaniyê re bû sedema ku gelek zarok ji siberoja xwe dûr bikevin û rastî gelek astengiyan hatin, piraniya wan ji bona debara jiyanê neçar man dev ji dibistanên xwe berdin û bi malbata xwe re alîkariyê bikin.**

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Dewleta Tirk a dagirker ji sala 2019 'an ve SerêKaniyê dagirkiye û heya roja îro êrîşên wê berdewamin, ev sûcên dijmirovî li pey xwe bi dehan dayîkên kezeb şewitî, zarokên sêwî hiştin, herwiha bi dehan jin hatin revandin, dest danîn ser mal û milkên gelek kesan lê tevê vê yekê jî hertim saziya mafê mirovan û netewên yekbûyî bêdeng dimînin û tu bertekê nîşan nadin.

Di derbarê êşa ku xelkê Serê kaniyê kişandin ji ber koçberiyê zarokên bi navê Rîda Salih û Kefa Amir ji Rojnameya me re axivîn.



Rîda Salih



Kefa Amir

### Çîroka Rîda Salih

Rîda Salih diyar kir ku temenê wî 9 salî ye xelkê Serêkaniyê ye û sedema dagirkirina dewleta Tirk ji mal û milkên wan re, ew û malbata xwe ev nêzî 5 sala ye di kampa Waşokanî de bi cih dibin. Bûyera şer qet ji bîra wî naçe, çawa ku dengê tang û topan tirsek xist dilê wî de û bandor li tenduristiya wî kir heya demekî jî nedikarî ji dayîka xwe veqete ji tirsa û wiha got:" Bavê min li ser erebeyê kar dike, di heman demê de ew û apên min di hundirê kempê de dikanek piçûk vekirine da ku em bikaribin debara jiyana xwe bikin, nêzî du salan bû birayê min karê vê dikanê dida meşandin, lê ji ber ku birayê min nizane bixwîne û binvîse gelek astengî didîtin, loma ez neçar mam ku dev ji dibistanê berdim û şûna birayê xwe kar bidim meşandin da ku di milê madî de bikaribim alîkariya malbata xwe bikim. Herwiha ez tiştên vê dikanê diçim ji sûka Hal tînim gelek bazirgan bi bihayekî giran difroşin min ev dibe astengî pêşiya min ku ez nikarim hemû pêwîstiyên dikanê bînim. Hêviya min ew e ku nêzîktirîn dem de em vegerin mala xwe da ku ez bikaribim carek din li dibistana xwe vegerim û xwendin nemîne hisret di dilê min de, ez jî wek hevalên xwe siberojeke min jî hebe."

### Çîroka Kefa Amir

Kefa Amir da zanîn ku temenê wê 9 salî ye malbata wê ji 9 kesan



pêk tê ew jî xelkê SerêKaniyê ne û di kempa Waşokanî de bicih dibin, di malbata wan de tenê ew û xwîşkeke xwe diçin dibistanê, xwişk û birayên wê yên din jî karên cûrbecûr dikin û wiha got: " Di demsala zivistanê de em rastî gelek pirsgirêkan tên yek ji wan jî rêye ji ber ku rê hemû dibin herî û golên avê em di rewşek zehmet re derbas dibin heya ku em dighin dibistanê. Di dibistanê de mamosteyên me gelek başin û em gelek rehetin bi wan re. Daxwaza me ew e ku em vegerin SerêKaniyê, ji ber ku ew cih û warê meye, êşa koçberbûnê ji hişê me dernakeve, her gava ku em tavêjin em hêviya vegerê dikin."

# Hazirtî û amedekariyên çandiniyê yên demsala zivistanê

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

**Hevseroka Rêveberiya Hilberîna Nebatan a Kantona Cezîrê Cînan Mejdo diyar kir ku niha li her derî dest bi çandiniyê kirine, wekî nok, nîsk, fûl û gelek tiştên din yên cur bi cur têne çandin û heya niha rewşa candiniyê başe.**

Cotkarên herêma Cizîrê amadekariyên xwe dikin ji bo destpêkirina demsala çandiniyê ya zivistanê, çandinî jêderek sereke ye ji welatiyê herêmê re û bi hezarê hektaran erd bi genim, ceh û gelek cureyên din tê çandin. Desteya aborî û çandiniyê ked û xebat dike ji bo peydakirina hemû pêwîstiyên çandiniyê ji cotkaran re weke gubre, tov û mazot, bi rêka çêkirina pilanek çandiniyê ji bo belavkirina tovê genim, mazot û gubre li ser cotkaran.

Derbarê hazirtî û amedekariyên çandiniyê yên demsala zivistanê, Hevseroka Rêveberiya Hilberîna Nebatan a Kantona Cezîrê Cînan Mejdo ji Rojnemeya me re axivî. Cînan Mejdo di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Desteya Çandiniyê her sal li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê pilanên xwe çêdike, bi taybet berhemên çandî yên ku ji axa me derdikeve parve dikin. Di pilana me ya salane de genim ji sedî 60 tê çandin, li gorî



wê em pêdiviyan bi cih tînin. Di serî de pilana çandiniyê wekî tov tê çandin û wiha berhem zêde dibe. Ji xwe di demekî de hin cih şewtîn û gelê me di asteke mezin de ji berhemên ku çandibûn bêpar ma, her wiha rêveberiyê tov li cotkaran belavkir."

### Zehmetî û astengî

Cînan balkişand ser zehmetî û astengiyên ku dirdikevin pêşiya wan û cotkaran û wiha domand: "Zehmetiyên ku li pêşiya me dibine asteng hene, niha ji bo ku mirov bikaribe genim û hemû cureyên çandiniyê bi awayekî baş derxe, pêdiviya wan bi mazotê heye. Ji lewra kêmbûyîna mazotê di karê me de pirsgirêkê çêdike, her kesî dît di demên dawî de ku dewleta Tirk a dagirker bi her awayî êrişî gelek pinesaziyên herêmê kir û gelek ziyanên madî jî bi xwe re da avakirin ku gel debara jiyana xwe ser dida meşandin, di heman wextî de jî deverên ku neft lê derdikeve jî di astekî de bê bandor



hatin hiştin. Plana ku me serê vê salê jî daye pêşiya xwe dîse ji sedî 60 em ê berhemên çandî bi keda civaka xwe ava bikin û di heman wextî de îsal tov di demeke zûtir de hate belavkirin, ji xwe kesên ku ziyan giha berhemên wan rêveberiyê bê piha tov li wan belav kir. Ji bo mazotê jî gelek xebat hate birêvbirin, di serî de me têkilî bi saziyên aleqeder yên wekî sûtemenî û desteya çandiniyê re danî."

### Kar û xebat

Cînan di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Xebatên ku her sal tên meşandin, em planan dideyînin da ku di kar û xebata me de kêmasî çênebin. Her wiha me saziyek serbixwe avakiriye da ku bi karê belavkirinê rabe. Ji xwe hijmarek xebatkarên me hene û pêwîstiyên ku hene tesbît dikin û bi erkên xwe radibin. Her wiha di debarkirina masoztê de jî ev saziya eleqedar bi erkên xwe radibe û li gorî wê mazot û tov ji bo cotkaran belav dike, yanî mirov dikare diyar bike ku di vî derbarî de xebateke gelek mezin tê meşandin. Ji bona belavkirina gubreyê jî cotkar diçê vê saziyê û li wir gubreyê digrin. Ji xwe behaya gubreyê 500 hezar bû, lê niha li gorî derfetên Rêveberiyê wê bihaya wê dakeve, ji ber ku her kes dizane em di dorpêçeke gelek mezin de jiyan dikin, peydakirina berhemên madî gelek zehmetî tê kişandin. Xebatên me di van demên dawî de gelek bi hêz bûye, li kûderê pêdivî hebe em xwe dighînin wir û hewl didin pirsgirêkên pêdiviyan bi cih bînin.

### 'Pêwîste cotkar li saziya ku tê zanîn vegerin'

Hevserokatiya Rêveberiya Hilberîna Nebatan a Kantona Cezîrê Cînan Mejdo di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Ji bo çandiniyê jî av pêwîste, ger rewşa baranê baş be wê demsalê wê rewşa berhemên çandiniyê jî baş be, lê ger baran kêm bû em êdî bîran bi kar tînin û ev jî ne wekî encamên baranê ye. Herî dawî em ji cotkaran daxwazî dikin ku her dem li saziya çandiniyê vegerin û destê xwe bikin destê saziya xwe de, ji ber ku em dibînin gelek cotkar ser bi xwe kar dikin û tov bi xwe peyda dikin. Ji lewra em bi hêvî ne ku cotkar li saziya ku tê zanîn vegerin, ji bo ku em jî bi xebatên wan re bibin destek û hêza alîkariyê."





# Rêkeftina Edeneyê

**Jîn Hisên/Qamişlo**

Weke tê zanîn têkiliyên di navbera dewletan li ser îmzekirina hevpeymanên cîrantî an bazirganî pêk tên, bi hewlidaneke ji bo pêşketina şaristanî an çandî, herwiha ji pirsgirêkên kevin re çareseriyek bê danîn. Dewleta Tirk di serdema xwe ya netewperestî û nijedperestî hewil da çend rêkeftin û hevpeymanan îmze bike bi armanca dagirkirina erdekî û qirkirina gelên ku di welatên xwe de bi awayekî ewle jiyan dikin, bi çend dewletan re Tirkiyê rêkeftin kir.

Her dem hikumetên diktator ji bo parastina xwe rêkeftinên elwehî, leşkerî û siyasî di destpêkê de bi dewletên kolonyalîst li dar dixe, herwiha bi hikumetên zalim û zordar. Ev mijar li ser dewletên zordar pêk tê, ku rewabûna xwe di rêya hilbijartinên demokratîk û azad ku civak tê de beşdar bibe pêk nayîne, lê berovajî vê yekê ji hêla dewletên kolonyalîst tên tayîn kirin, yên ku ew dewlet dagirkirine piştî ku ji wî welatî derketin, li ser easê bidestxistina serxwebûnê, ku tenê mijar şeklî dimîne.

### Tirkiye û kompleksa kurdan

Tê xuyanî kirin ku ev kompelesk wê berdewam bike heta ku ev doz bi temamî bê çareserkirin. Di nêrîna rêjîma Tirkiyê de divê ev di rêya qirkirina kurdan çi fîzîkî an di rêya kumkujiyan pêk bê, ku di riya menewî jî pêk tîne di rêya asîmîlasyona kurdan di nava Osmaniya nû de, û li gorî berjewendiyên Tirkiyê bê meşandin.

Gelek şoreş û raperînên kurdî li hemberî dagirkeriya Tirk pêk hat, lê hemû bi zordarî û hêzê têkçûn. Lê ev yek bi şoreşa dawî pêk nehat, bi pêşengtiya Partiya karkerên Kurdistanê ji destpêka avabûna wê di 27`ê Mijdara sala 1978`an û heya niha. Tevî dîlgirtina rêberê wê Abdullah Ocalan di encama komploya navdewletî ku di 15`ê Sibatê li dijî wî pêk hat û heya niha berdewame, û tevgera azadiya kurdistan di gelek waran de destkeftiyên mezin bdest xist.

### Damezirandina Partiya Karkerên Kurdistanê

Piştî damezirandina Partiya Karkerên Kurdistan, Rêber Abdullah Ocalan ber bi qada Rojilata Navîn ve derket di rêya Sûriyê de di sala 1979`an, piştî salekê serfermandarê giştî Kenan Êvrîn derbeyeke leşkerî pêk anî, ku ji tundtirîn derbeyên li Rojhilata Navîn pêk hat. Armanca wê têkbirina Tevgera Azadiya Kurdistanê bû. Qanûna Urfî li Kurdistanê hate ragihandin. Li gorî wê bi hezaran kurd û çepgir hatin girtin, li gel înfazên meydanî, revandin, tevahî sûcên hatin kirin li dijî kesên nenas hatin tomarkirin. Bi hezaran ji rewşenbîr, çalakvan û siyasetmedarên kurd bûn qurbanî.

### Fişarên li ser Sûriyê ji bo derketina Abdullah Ocalan

Bi derketina Rêber Abdullah Ocalan ji Sûriyê, ku di nava hêzên xwe de tevgerên azadiya erebî û cîhanî dihewand, ji hêla Tirkiyê zext lê dihat kirin, bi taybet di mijarên avê û dorpêçkirinê û piştgiriya wê ji bo tevgera azadiya kurdistanê. Di rêya Israîl de ev zext zêdetir bûn, ku dixwst li gorî xwe doza kurdî çareser bike, bi taybet piştî îmzekirina hevpeymana bi navê(Têkoşîna li dijî terorê) di navbera Emerîka, Israîl û Tirkiyê de, armanca sereke Partiya karkerên Kurdistanê û rêber Abdullah Ocalan bû.

### Sûriyê neçar hiştin

Bi îtîfaqa Viyana ya 1961`ê de xaleke zelal heye ku dibêje dewletek di bin gef û êrişan de bê ger rêkeftinek çêbibe ew rêkeftin nerewa ye. Rêkeftina Edene jî di bin gef û êrîşên di nava Sûriyê de pêk hat. Artêşa tirkiyê li ser sînorê bakur yê Sûriyê bû, gef dida ku ewê êrîşekê pêk bîne dema ku Rêber Apo ji Sûriyê dernekeve. Li gor zagonên navdewletî rêkeftinên di nav rewşên wiha de nayên qebûl kirin. Ji aliyê din ve jî ew rêkeftin ne di navbera du dewletan de bû, di navbera du saziyê ewlehî yê de bû. Rêkeftin ji neçarî hat erêkirin. Dewletên Ereban jî zext li ser dikirin. Husnî Mubarek jî di vê peymanê de rol liyîst. Ji Sûriyê re got ku ger tu têkeve şer wê ev şer şerê te be û yê Tirkiyê bê. Ne yê Ereban û Tirkiyê be. Bi vê jî Sûriyê neçar kir.

### Rêkeftina Edeneyê

Rêkeftin di navbera Tirkiyê de bi nûnertiya Cîgirê Wezîrê Derve yê wê demê Ugur Ziyal û hikûmeta Sûriyê bi nûnertiya Adnan Bedir El-Dîn el-Hesen di 20`ê Cotmeha 1998`an de li bajarê Edeneyê yê Tirkiyê hat îmzekirin. Di serdema Serokê Sûriyê Hafiz Esed û Serokomarê Tirkiyê Suleyman Demirel.

Tevî ku Rêber Abdullah Ocalan di 9'ê Cotmeha 1998'an de ji Sûriyeyê derket, bi pasaporta Qibrisê derbasî Yewnanîstanê bû, ji bo ku serî li dadgehên Ewropayê bide, da ku pirsgirêka gelê Kurd pêşkêş bike û bi rêyên aştiyane çareser bike, lê Tirkiye tenê berdewamiya fişara li ser Sûriyê qebûl kir, nemaze ji ber



nexweşiya serokê berê yê Şamê Hafiz el-Esed, "Peymana Edeneyê" li ser wî hat ferzkirin, ku di 20`ê Cotmehê de hate îmzekirin. Piştî derketina Rêber Abullah Ocalan ji Sûriyê bi 11 rojan.

Tiştê herî giring di rêkeftinê de hat mijara Partiya Karkerên Kurdistanê bû, ji mafê Tirkiyê ye ji bo destwerdana li ser xaka Sûriyê heta pênc kîlometran, li ser sînor, ji bilî wê yekê ku Sûriyê piştgiriya xwe ji partiyê re rawestîne, radestkirina endamên partiyê yên di xaka sûriyê de ne, herwiha rê li ber çalakiyan wan bê girtin.

### Xalên Rêkeftina Edeneyê di navbera Sûriyê û Tirkiyê

Ev rêkeftin bi çavdêrî û alîkariya Îran û Misrê hate kirin û hejmarek ji xalan li xwe girtine:

Ji xalên sereke yên Rêkeftina Edeneyê:

- Nabe Abdullah Ocalan li Sûriyê bimîne û rê neyê dayîn ku careke din derbasî Sûriyê bibe.
- Rê ji endamên Partiya Karkerên Kurdistanê re yên derve nayê dayîn ku derbasî Sûriyê bibin.
- Nabe baregehên PKK`ê li nav xaka Sûriyê hebin û nabe jî ku çalak bibin.
- Hejmarek ji endamên Partiya Karkerên Kurdistanê hatin girtin û dadgehkirin.

### Herdû aliyên Tirkiye û Sûriyê li ser van xalên jêrîn gihiştin rêkeftinê:

- Sûriye rê nade ku xaka wê ji bo gihandina ziyanê ji Tirkiyê re, bê bikaranîn û rê jî nade ji bo hawirdekirina çek û keresteyên lojestî û alîkariya darayî û propagandayê ji bo çalakiyên PKK`ê li ser zeviyên Sûriyê.
- Sûriye Partiya Karkerên Kurdistanê weke rêxistineke terorî li ser lîsteya teorê tomar kir.
- Sûriye rê nade PKK`ê ku bargehên leşkerî û çalakiyan li nav xaka Sûriyê bike.
- Sûriye rê nade endamên PKK`ê ku di riya xaka wê derbasî welatekî din bibin
- Sûriye wê hemû tedbîran bigre ji bo rê li ber derbasbûna pêşengên PKK`ê bigire.

### Her du alî li hev kirin ku mekanîzmayên taybet ji bo cîbicîkirina bendên Rêkeftina Edeneyê pêk bînin:

-Peydakirin û karkirina hêleke telefonî di navbera desthilatên ewlehî de, li ser asata bilind, di navbera herdu dewletan de.

-Herdû alî wê nûnerên ewlehî yên taybet li nav şandên xwe yên diplomasî li Enqere û Şamê de destnîşan bikin.

-Aliyê Sûrî wê rêkarên pêwîst bide ber xwe ji bo pabendbûna bi bendên rêkeftinê û gihiştina bi encamên guncaw.

Li ser bingeha wê rêkeftinê, nakokiyên sînorî yên herdû dewletan bidawî dibin.

Eger aliyê Sûrî di standina tedbîrên ewlehî yên pêwîst de biser nekeve, êdî ji mafê Tirkiyê ye, heta kûrahiya 5 kîlometreyan derbasî nav xaka Sûriyê bibe.

### Hevpeymana Sûçiyê 2019`an

Di sala 2019`an de di salvegera komploya navnetewî ya li dijî rêber Abdullah Ocalan di 9`ê cotmehê de êrîşeke berfireh li ser xaka rojava kir, bi taybet ser bajarê Serêkaniy û Girê Spî, bi nave operasyona( Kaniya Aştiyê), piştî erêkirina hêzên heyî li ser xak Sûriyê( fedrasyona Rûsiya û Emerîka) bi taybet piştî biryara serokê Emerîkayê yê berê Donald Tramp ku hêzên xwe ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê vekişîne, her du bajar hatin dagirkirin. Piştre di navbera Trikiya û Rûsiya de hevpeymana Sûçiyê hate îmze kirin, ji giringtirîn bendên tê de hat wiha ne:

-Pabendbûna parastina yekrêziya Sûriyê.

-Têkoşîna li dijî terorê bi hemû awayên wê.

-Tekezkirina giringiya ( Rêkeftina Edeneyê) ji ber ku her du alî pabendbûna xwe tekez kirine ser yekrêziya herêmî û siyaseta Sûriyê, herwiha parastina ewlehiya niştimanî ya tirkiyê.

-Dûrxistina Hêzên Sûriya Demokratîk û çekên giran bi dûrbûna 30 km ji sînorê tirkiyê.

-Li rojava û rojhilatê herêma operasyona "Kaniya Aştiyê" bi kûrahiya deh kîlometran, ji bilî Qamişlo, dewriyeyên hevbeş ên Tirkiye û Rûsyayê pêk tînin.

### Rewşa dema heyî


Siyaseta Tirkiyeyê ya ji mêj ve kuştin û qirkirina gelan berdewam e, herwiha bi tu rêkeftina an hevpeymanan îi ya Edeneyê be an Soçiyê ne pabende. Herdem êrîşêan ser welatên cîran dike û destwerdanê di kar û barên hundir yên wan welatan dike, da ku têçûnên xwe yên hundirîn veşêre. Her kes dizane çawa Lîwa Iskenderûn ya Sûriyê dagirkir û kir parçeyek ji Tirkiyê di rêya rêkeftinek di navbera Fransa û Tirkiyê de, wekî di dagirina wê ji xakên Sûriyê di salên borî de weke( Izaz, Bab, efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî û Cerablis û ji xeyî wan). Planên ku metirsiya perçekirin û tunekirina zêdetir axên Sûriyê dikin, û nakokiyên civakî di navbera pêkhateyên niştimanî yên curbecur de çêdikin, piştî têkçûna hewildanên bi çekên çeteyan û komên terrorist, ku bi pêşengtî û perspektîfên dagirkeriya Tirkiyê kar dikirin, da ku nasnameyên gelên xwecihî û resen tune bikin û wan ji holê rakin, yên ku bûne armancên hêzên hegemonin.

# ‘Pêngav wê heta misogerkirina Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo dewam bike’

**Pêngava cîhanî ya “Ji Rêber Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî” saleke dagirtî û dijwar li pey xwe hişt. Menan Cafer diyar kir ku heta misogerkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo wê pêngav bi hemû hêza berdewam be.**

**Amara Baran/Qamişlo**

Pêngava cîhanî “Ji Rêber Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî” ku di 10 Cotmeha 2023’an de hatibû destpêkirin. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi pêşengtiya însiyatîfa Surî a parastina Rêber Apo, gelek çalakî hatin lidarxistin û xebat hatin meşandin. Ev çalakî bi avakirina tekiliyan ji bo teşwîq û danasîna vê pêngavê li ser asta Rojhilata Navîn gelek xebatên cûr be cûr jî hatin meşandin. Bi hezaran kes ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan îmzeyên xwe avêtin, li ser daxwaziya azadiya Rêber Apo ji hemû pêkhateyên ku li Bakur û Rojhilatê




Suriyê dijîn û gelek bajarên Sûriyê yên wek Şam, Latqiyê, Himisê û Siwêda jî hemle hatin destpêkirin. Derbarê mijarê de berdevkê Însiyatîfa Sûriyê a azadiya Rêber Abdullah Ocalan Menan Cafer ji rojnameya me re axivî.

**‘Di nav salê de gelek xebat hatin meşandin’**

Menan Cafer di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser destpêka pêngava cîhanî ya azadiya Rêber Apo û wiha got: “Di nav hemlê de konên protestoyê hatin danîn û gelek xwepêşandanên şermezarkirina reftar û kiryarên ku dewleta tirk hatin pêkanîn. Daxuyanî, civînên girseyî yên gel, kom xebat û civînên xwendina Sosyolojiya azadiyê nîqaş û analiz hatin kirin. me wek însiyatîfa suriyê ji bo azadiya Rêber Apo nameyên elektronîk ji bo na meclis û rêxistin û organîzyasonên navnetewî hatin şandin, ji wan rêxistinan komîteya li dijî îşkencê ya Ewropî û CPT, dadgeha dadwerî a dû alî ya navnetewî, komisyona mafê mirovan ê netewên yekbuyî, bijîşkên bê sînor, rêxistina tendurîstî a navnetewî, rexistina çavderî a mafê mirovan meclîsa netewên yekbûyî yên mafê mirovan , dadgeha tawanan yên navnetewî, dadgeha efû, meclîsa Evrûpa û gelek rêxistinên demokratîk yên mafê mirovan re mesaj hatin şandin ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo. Lê kêleka van xebatan danîn û tekîlî li darxistina li liser asta Rojhilita navîn bi komek ji siyasetmedar, wêjevan û çalakvanên mirovî û siyasî rewşenbîr û kesayetên ku tekîldarê peywendiyên mafê mirovan, rojnamevan û kesên ku di kar û barên navnetewî de pisporin gelek dayîn standin û peywendî hatin danîn ji bona ku kampanya “ ji Rêber Apo re azadî ji pirsgirêka kurd re çareserî “ pêş bikeve û bi leztir gavan bavêje ku zextekî li ser dewleta tirk a faşist bê kirin.”

**‘Li gelek welatan konferans hatin lidarxistin’**

Menan Cafer axaftina xwe wiha domand: “Ji bo ku hindek kesayet bi me re bikevin tekîliyê û kampanyayê dewlemend bikin, gotar, post, hashtag, û tevlîbûne bernameyên wek radyo televizyon, tora civakî bûn. Heman deme de însiyatîfa Amezîxya a însiyatîfa Rêber Apo ji hêla rêxistina kongra navnetewî ya Amezîxî hat li darxistin û di hindir sînponozma ku me li darxist de konferansek ji bo azadiya fîzîkî û şermezarkirina komploya navnetewî a li ser Rêber Apo li Heleb, Reqa û Cizîrê gelek sompozîsyon û kom xebat hatin li darxistin ji bo ku em bigîhijin encama ku em çawa kampanya xwe pêş bixin. Ji bo ku em bi teknîk û rêbazên xwe zextê li dewleta tirk bikin û tecrîdê bişkînin û bigîhijin azadiya fîzîkî a Rêber Apo, rêxistina kongrê a Mesîhî a navnetewî bi daxuyaniya piştgirî dan pêngava azadiya fîzîki a Rêber Apo. Ji bakurê Efrîqa heta Misrê, Mexrib, Amezîxya, Birîtanya û heta barbaran dewa azadiya gelê bindest dikin.”

**‘Berjewendiyên di navbera nato û dewleta tirk de veşartina doza kurdî ye ‘**

Menan derbarê firehkirina pêngavê wiha got: “Ji bo ku em pêngavê berfireh bikin rêxistinên ku ji wan re mesaj şandine, em ê bişopînin û pêdaçûnekî bikin ji bo bileztir û bi bandor rola xwe bileyîzin ew erkê li ser mile wan em di warê mafê mirovan de bikin rojevê. Berjewendiyên di navbera dewletên nato û Tirkiyê de veşartina doza kurdî bi taybet li ser Rêber Apo hebûn. Bi zexta rêxistinên navnetewî de taybet yên mafê mirovan û meclîsa Evrûpî civînek lidarxistin divî civînê de wek hişyariyek dan dewleta tirk ku vî tecrîda giran Ya li ser Rêber Apo rakin û mafê wî yê qanûnî û mafê wî yê hêviyê bidin ji ber ku 26 salên xwe li îmraliyê dagirt ji mafê wî ye ku ji zindanê derkeve û fîzîkî azad bibe.”

**‘Dewleta Tirk zagonên navnetewî binpê dike’**

Menan Cefer axaftina xwe wiha domand: “Di pêngava “Ji Rêber Apo re azadî ji pirsgirêka kurd re çareserî” de ne tene însiyatîfa Sûrî a Rêber Apo, gelek sazî û rêxistinên din jî piştgirî kirin. Bi hevkariya saziyan kesayetên



Rewşenbîr û kesayetên navnetewî yên bi bandor û rêxistinên mafê mirovan gelek çalakiyên cûr be cûr hatin meşandin. Ev demeke dirêje ku dewleta tirk zagonên navnetewî binpêdike û nahêle malbat û parêzer hevdîtîn bikin, ev jî tê wê wateyê ku dewleta tirk gelek tengav bûye û ji hêza Tevgera Azadiya Kurdistanê ditirise ji bo wî jî Rêber Apo wekî asteng dibîne . Lê wê paradigma û felsefeya Rêber Apo hemû komployên dewleta tirk û hevkarên wî vala derbixîne. “

**‘Pitgiriya pêngavê her ku diçe berfirehtir dibe’**

Menen axaftina xwe wiha qedand: “Li ser asta navnetewî gelek rêxistinên mirovî taybet li herema Baskê û herema Katalonya parlamenter jî piştgirî dan kampanyayê daxuyanî, xwe pêşandan û meş hatin lidarxistin. Herwiha li bakur û rojhilatê suriyê kesên ku fikir û felsefeya Rêber Apo pejirandine xistine raftarê xwe yên rojane ku azadî û demokrasiye bi destbixin û tecrîdê bi dawî bikin, ji ber ku Rêber Apo temsîla hemû hêzên azadîxwaz dike û nûnertiya gele kurdîstanê dike ev bi dehan salin tekoşîn dike ku dadwerî û edaletê, mirovahî û demokrasiye li rojhilata navîn pêk bîne. Rêber Apo 25 salin pêşniyara konfederalîzma demokratîk dike, îro jî li Rojhilata navîn de ev çareseriya sereke-ye ku ev kirîz bê çareserkirin. Ev şerên ku li Rojhilata navîn diqewime çi li yemene be çi li Iraq, Libnan û çi jî li sûdanê ev hemû kiriz bi konfederelazma demokratîk têne çareserkirin. Di asta navnetewî de ne tenê însiyatîf hemû hêza azadiya kurdîstanê ketiye tevgerê de. Heta ku hêzên demokratîk îro pêştgiriya me dikin ji 74 dewletan îro zanyar rêxistinên demokratîk rexistinên mirovî piştgiriya kampanya azadiya Rêber Apo dikin. Kampanya “ azadî ji Rêber Apo re ji pirsgirêka kurd re çareserî” de hemû cîhan dengê xwe bilind kir, ne pêkane bê Rêber Apo ev kirîz werin çareserkirin û pêwîste demil dest kilîta çareseriyê were çareserkirin.”



## Rê nadin hilbijartin û demokrasî bimeşe!

**Dilyar Cizîrî**

Ev demeke hilbijartinên dema şeşan a perlementoya Başûrê Kurdistanê di rojeva tevahî gelê kurd û bi taybet xelkên Başûrê Kurdistanê de ye. Roja 20’ê vê mehê hilbijartin hatin lidarxistin. Beriya hilbijartinan di gelek nirxandin û şîroveyan de hêviya guhertineke cidî ya di herêmê de tune bû.

Di atmosfera beriya hilbijartinan de Serokê YNK’ê Bafil Celal Telebanî xwest li hember PDK’ê hewldaneke mezin nîşan bide. Heta radeyekê di kombûyîn, mîting û bernameyên xwe yên hilbijartinê de di hin mijaran de rastî anîn ziman. Bi taybet di warê hevkariya PDK’ê û dewleta Tirk de.

Lê carek din jî diyar bû ku PDK’ê û hevkarên xwe dewleta Tirk wê rê nedin YNK’ê û partiyên din.

Wê bi hemû hêza xwe ne hêlin di parlemenê de guhertin çêbibe. Ev di hejmara dengan de jî diyar bû. Li gorî raporên li ser hin ragihandinên Başûrê Kurdistanê hatin weşandin, PDK’ê di hilbijartinan de, gelek binpêkirin, sextekarî û derqanûnî wekî din kirine.

Berê jî malbata Barzanî ku hemû kursiyên bilind ên rêveberiya herêmê li hev parvekirine,tu rol ji parlemantoyê re ne hiştibin, nêrîna min piştî hilbijartinan jî wê hewl bidin bi riya hevgirtin û anîna komên kêm li kêleka xwe kursiyên xwe biparêzin. Ji niha jî ve diyar dike wê ev hilbijartin tu guhertineke cidî bi xwe re neyne.

Bi taybet di vê demê de ku PDK’ê ji berê zêdetir Başûrê Kurdistanê ji artêşa Tirk û istxbaratê wê re vekiriye. Dagirkeriya xwe bi riya barageh û Artêşa xwe berfireh kiriye. Li ber vê tenê jî nesekinîn, bi hêza xwe ya leşkerî û istixbaratî piştevaniya dewleta Tirk dike. Wan jî wiha barê herî giran ê şerê Artêşa Tirk li dijî gêrîlayên tevgera azadiyê rakirine.

Ji ber wê jî PDK’ê wê tu carî rê nede bi riya demokrasî û hilbijartinan guhertineke cidî di sîstema Başûrê Kurdistanê de pêk were.

Dewleta Tirk jî herî kêm di vê demê de wê bi hemû riyan derfetê nede guhertinek cidî di herêmê de pêk were. Lê heger mirov li encamên hatine aşkerekirin, temaşe bike, PDK’ê ku di sala 2018’an de 45 kursiyên parlemanê bi dest xistibû, li gorî encamên heta niha negihandiye 40 parlamenteran. YNK’ê tu zêdebûnek mezin bi dest nexistiye. Tevgera Nifşin Nû ku xwediyên 8 kursiyan bû, hejmara parlamterên xwe zêde kirine.

Di vir de pêwistî pê heye Rêveberiya YNK’ê li xwe vegere, çima di van hilbijartinan de nikarîbû encamên zêdetir bi dest bixîne. Diyare rêveberiya YNK’ê di çarçoveya xwe de ma, nikarîbû hîn zêdetir di nava civakê de bandor çêbike.

Ev jî niha barê YNK’ê û partiyên din ên li dijî rewşa heyî ya herêmê ne, girantir dike. Di vê demê de pêwistiya gelê Başûr bi bilokek bi hêz a hevgirtî heye.

Ancax di rewşa heyî de ew biloka yekgirtî karibe li dijî siyasetên PDK’ê û hevkariya wan bi dewleta Tirk re rol bilîze. Ji bo ew yek pêk neyê PDK’ê û dewleta Tirk bê navber di nava tevgerê de ne. wê rê nedin bi awayekî demokratîk guhertinek cidî pêk were.



# ‘Saziyên navneteweyî ji bo destekdayîna koçberan ne li gorî sozên xwe ne’

**Hevserokê Nivîsgeha Karûbarên Koçber û Penaberan, Şêxmûs Ehmed da zanîn ku koçberiya ji Lubnanê ber bi herêmê ve hîna berdewam e. Herwiha Ehmed eşkere kir ku sazî û rêxistinên cîhanî yên mirovî soz û peywendî bi Rêveberiya Xweser re ji bo destekdayîna dan û çêkirin, lê ew ne li gorî sozên xwe derketin.**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Ji ber êrişên Israîlê li ser Lubnanê, bi hezaran kes ji Lubnanê ber bi herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve koçber bûne. Ji van koçberan piranî welatiyên Sûriyê ne û di heman demê de koçberên Lubnanê jî, bi sedema êrişan herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke cihekî aram ji xwe re dîtine. Derbarê heman mijarê de hevserokê Nivîsgeha Karûbarên Koçber û Penaberan a Rêberiya Xweser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Şêxmûs Ehmed bersiva pirsên me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Ji destpêka êrişên Israîlê li ser Lubnanê ve heta roja îro, çend koçber derbasî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûne û Rêveberiya Xweser heya çi astê destek da wan?**

Bi destpêkirina êrişên Israîlê li ser Lubnanê re, pêleke koçberiyê çêbû, di encamê de jî gelên Lubnanê, Sûriyê û hem jî pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên ku li wir diman, berê xwe dan herêma me. Rêveberiya Xweser li Beyrûtê komîteyek ji bo karûbarên koçberan ava kir û li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî şaneyek hate ava kir. Herwiha 4 dergehên ji bo pêşwazîkirina koçberan hatine destnîşankirin. Bi riya van dergehan re jî gelên Sûriyê û koçberên Lubnanê derbasî herêmê bûn. Welatiyên me yên ku li Lubnanê diman û pirsgirêk di nasnameyên wan de hebûn an jî pirsgirêkeke din a wan, girêdayî xizmeta leşkeriya hikumeta Şamê hebû em bi wan re bûn alîkar. Hem jî koçberan rastî gelek pirsgirêkan dibûn di riya hatina wan de, çi li ser



xalên kontrolê yan jî kiriya bas û erebeyan a buhabilind. Lê dema ku koçber gihan herêmê jî, di her warî de me destek da wan, çi ji hêla jiyanî ve be an jî tenduristî de be.

**-Rewşa koçberên Lubnanê çawa ye, hîna pêla koçberiyê berdewam e an rawestiyaye?**

Rewşa koçberan li Lubnanê gelek zehmet e, ji ber ku bi sedan welatî di gelek deveran de asê mane û nikarin jê derkevin. Wekî em dizanin komîteyek ji bo veguheztina koçberan ji wir ber bi herêmê ve, hatiye amadekirin, lê koçber ji ber rewşa êrişan nikarin xwe bighînin devera destnîşankirî. Êrişên li ser Lubnanê hîna berdewam in, rewş jî bi alozî û dijwariyeke mezin derbas dibe. Ev yek jî rasterast bandoreke mezin li ser zêdebûna pêla koçberiyê ber bi Sûriyê re ava dike. Hîna rewşa koçberiyê didome û bi awayekî rojane koçber ji her çar dergehan ve derbasî herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibin. Hejmara wan jî di dema heyî de bi giştî 19 hezar û 735 bû, ji wan 6 hezar û 109 jin in. Herwiha 6 hezar û 305 zarok, di nav van koçberan jî 76 kesên lubnanî hene, li gel van kesan jî 19 kes bi mirîtî derbasî herêmê bûne.

**-Heta niha saziyên navneteweyî destek dane koçberên Lubnanê yên ku li herêmê bi cih bûne yan na, gelo ji bo vê mijarê peywendî di navbera we û sazî û rêxistinên mirovî yên cîhanî de çêbûne an jî sozên alîkariya koçberan bi we re kirine?**

Şer û pevçûna ku li Lubnanê, hem jî êrişên li pêk tên bûye pirsgirêkeke navdewletî. Ji destpêka derketina vê kirîzê re heta roja îro jî, rêxistin û saziyên navneteweyî ji bo rewşa penaberan gelek peywendî bi Rêbereriya Xweser re çêkirin. Van sazî û rêxistinên parastina mafê mirovan ên cîhanî sozên destekdayîna koçberan dane me. Lê heya niha ti alîkarî û destekdayîn ji koçberan re pêşkêş nekirine. Ti desteka saziyên navdewletî ji kampên koçberan ên ku penaberên Serêkaniyê û Girê Sipî wekî din jî bi taybet kampên ku ji bo koçberên ji Lubnanê hatine herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê re nehat kirin. Tevî zor û zehmetiyên ku koçber û penaber li herêmê dibînin, lê saziyên navdewletî desteka ku tê xwestin nake û tev jî dikeve ser milê Rêveberiya Xweser de.

**-Di siberojê de wê rewşa koçberan çawa be, gelo mayîna wan li herêma Bakur û Rojhlatê Sûriyê wê ji herêmê re, çi rewşê biafrîne?**

Di sala 2023’an de Rêveberiya Xweser insiyatîfek ji bo penaber û koçberên Sûriyê ji raya giştî re pêşkêş kir, pê re jî girêdayî pirsgirêka Sûriyê û çareserkirina wê bû. Ev yek jî rewşeke mirovî ye, em dizanin ku bi melyonan kes kober û penaber bûn ji Sûriyê. Va ye îro bi hezaran koçberên sûrî ji Lubnanê vegeriyan herêma me. Ev veger tiştekî normal e û erînî ye ku welatiyên sûrî vegerin cih û warê xwe. Ji xwe Rêveberiya Xweser li gorî pîvanên navdeletî nêzî koçber û penaberan bû. Rêbereriya Xweser ji bo destekdayîna penaberên Sûriyê û koçeverên Lubnanê bû destekek û bi erkê xwe rabû. Destekdayîn û pêşwazî jî wê bandorekê li ser rewşa siyasî ya Sûriyê û siberoja Sûriyê bide avakrin.

**-Hetanî ku koçber vegerin warê xwe, li Rojhilata Navîn, bi taybet li Filestîn û Israîlê pêwîste çi bibe?**

Aloziya ku di dema heyî de li Rojhilata Navîn derdikeve ne tiştekî nû ye, bi taybet li Israîl û Filestîn, ev şer û pevçûn berî niha bi 10’ê salan dest pê kiriye, Lubnan jî di heman rewşê dijî dike şer û tundî dihat kirin û hîna jî didome. Ev şer û pevçûn bi neyînî bandorê li rewşa civakê dike û wê siberojeke xerab û ne diyar biafrîne. Li aliyekî din jî bandoreke neyînî li ser rewşa siyasî û ya ewlehiyê ya herêmê çêdike. Iewma jî dem dema ku diyaloga aramî, wekhevî û aşîtiyê were pêkanîn. Di destpêkê de mafê hemû pêkhateyan were parastin, çi di milê netewperweriyê de be an jî baweriyê de be. Eger xiristyanî be, mislman be, cihû be, kurd be, ereb, tirk, faris û hwd… be pêwîste li hevkirin û diyalogek çêbibe. Li ser vê bingehê jî hemû bawerî, ol û netew li bi hev re bi wekhevî û aştî bijîn.

## Erdogan fêrbûye ku derfeta bi xirab kar bîne



**Zekî Bedran**

Gelê Surîyê ji ber şer di şert û mercên pir dijwar de têkoşîn dikin. Milyonan welatî penaber bûne. Rewşa aborî pir xeter e. Welat giran birîndare û birînên wê nehatine girtin. Xwînhatin didome. Gel birçiyê azadiyê, demokrasiye û aramiyê ye. Li dijî vê kesên ku welat rêve dibin û polîtîkayan diyar dikin ji ber hesabên xwe yê deshilatdarî û berjewendiyên xwe gel avêtine kêlekê. Gel belave û bêrêxistin e. Herêmên ku rejima BAAS’ê deshilatdare derfetê lêgerîna mafan, nîqaş û denge xwe dayîna bihîstandinê nîne. Hemû çapemenî û saziyên dewletê di destê BAAS’ê de ye.

Şerê Filistîn û Îsraîlê yê ku ji sala par ve didome û tevlîbûna vê ya Hîzbûllah jî rewşa Surî zêdetir xirab kiriye û nedîyarî zêde buye. Gelê Surî pêşiya xwe nabîne û di derheqê pêşerojê de pêşbînîyeke baş û bendewariyeke xwe nîne. Rojhilata Navîn bi tevahî dikele. Dê Surîyê di vê rewşê de çawa derkeve ne diyar e. Di rewşa heyî de Surî bêdenge û tevlî şer nebuye. Lê welatekî ku şer herî zêde lê bandor kirîye ye. Ên ku alîkariyê didin rêvebiriya Beşar Esed û wê li ser piya digrin Rusya, Îran û Hîzbûllah e. Niha Hîzbûllah û Îran di şer de ne. Îsraîl di Sûrî de hebûna Hîzbullahê ji nêz ve dişopîne û armancên ku diyar dike her tim lê dide. Heta balyozxaneya wê hemû hebûna Îranê tê armanc kirin. Di heman demê de hêzên DYA jî, dibe hevkarê Îsraîlê. Bi hevsengîyekê armancên dewleta Îranê yên ku tê diyar kirin dibe armanca dewleta Israîlê .

Rusya dixwaze rewşa xwe ya heyî biparêze. Li dijî êrîşên Îsraîlê jî helwesteke xwe ya çalak û bibandor nîne. Pirsgirêk û şerê Ukranyayê ya ku serê xwe alandiye bala wê kişandiye wê eniyê. Wisa dixwiyê ku tevgera wê ya li Surî lewaz buye. Lê dixwaze Esad li ser piya bihêle. Ger ku rêvebiriya Esad biçe şansê Rusya ya mayîna li Surî namîne. Cihê ku Îhvan û hêzên wek wê hebin li wê derê Rûsya nayê xwestin. Derveyê wê hêzên Rojavayî jî dixwazin ewana bê bandor bin. Ji xwe Emerîka û Dewletên Ewropayê naxwazin cihê wek Îdlîbê jî bikevin di bin qontrola Surî. Li dijî rehetbuyina Rusya bihêzbûna rejîmê ne.

Tirkiye ji ber sûdwergirtina vê rewşê hêzên xwe li Îdlibê dihêle. Li Îdlîbê dewleta Tirk bi hêzên Rojavayî re hevpar tevdigere. Erdoxan Îdlîbê diparêze. Bi hinceta ‘Bila êrîş li ser wir çênebe, ger ku çêbe dê sed hezaran penaber biherikin Tirkiyê’ der dixe pêş. Ji xwe cihên ku di bin dagirkeriya dewleta Tirk de deh hezaran hêzên çekdar ên devşîrme bi giştî di xeta Îhvan û Sûnî de tên rêxistinkirin. Beşeke van ya girîng berê, rêxistinên wek DAIŞ û El Kaîde de cîhên xwe digirtin. Ew ji ber ku lîsteyên terorê de cîh digrin û di cîhanê de berteka kom dikin Erdoxan wana makyaj dike. Navê wan diguhurîne di rêxistinên cûda de bi cîh dike.

Niha armanca bingehîn ya faşîzma Erdoxan ji holê rakirina Rêveberiya Xweser û Kurda ne. Ji ber vê Rusyayê dike devrê û ji bo hevkariyê zextan li ser rêveberiya Esad dike. Erdoxan baş dizane ku tenê bi hêza Tirkiyê ve nikare van hedefan ji holê rake. Ji ber vê ew rewşa ku Esad tê de ye wê bi rengekî xirab bi kar bîne û wê bikşîne li ser xeta xwe. Rusya ji bo ku sûd li Tirkiyê werbigre, Tirkîye zêdetir li Surî tevlîheviya dernexe û ew ambargoya ku li hember wê tê pêkanîn Tirkiyê derveyê wê bihêle tawîzan dide.

Hîzbulllah her tim cihên germ ên pevçûnan de cîhê xwe girt. Niha Hîzbullah zehmetiyan jiyan dik e. Şerekî giran re rû bi rû ma. Tirkiye di vê mijarê de naxwaze firsendê birevîne. Bi taybet dixwaze Heremên Firat û Şehbayê bidest bixe. Hêzên Hîzbûllah ên di wê cepheye de ger ku paşve vekişin û biçin Lubnanê dê Surî lewaz bibe. Dîsa Îran jî wek berê nikare giraniya xwe bide Surî. Serê Îranê di belayê de ye. Îsraîlê bi gotina ‘’Me mil birî, niha jî dor li govdê ye’’ Îran kir armanc. Tê gotin ku dê ha îro ha sibê lê bixe. Erdoxan jî dixwaze ji vê rewşê sûd werbigre û heremê ji kurdan paqij bike. Qaşo ev herêm giştî di bin serwerîya Hikûmeta Şamê de ye. Lê belê Kurdên berê li wê derê jiyan dikirin û ji Efrînê hatine û li wan deran jiyan dikin hebûna xwe didomînin.Pirsgirêka bingehîn ya Tirkiyê paqijiya etnîkî û mişextkirina Kurdan ya li herêmê ye. Ger ku li wan herêman bigire ji xwe Heleb dikeve di bin metirsî û gefên dewleta Tirk ya dagirker. Li ser lewazbûna Sûrî dê berê çeteyan bide Helebê. Ger ku cihekî wek Helebê bikarîbe bixe di bin serwerîya xwe wê demê êdî dikare wê derê îlhak jî bike û bigre di bin deshilatdariya xwe. Herî kêm dê bikarîbe Esad li ser masê bide rûniştandin û şertên xwe lê bide pejirandin.

Erdogan ji alîyekî dibêje bila bi awayekî lez li Filîstîn û Lubnanê de şer bisekine û agirbest bê îlan kirin ji aliyê din jî bingeha pevçûn û dagirkeriyên nû dixwaze biafirîne. Jixwe artêşa wî li Surî bi cîh buye. Êrîşen wê yên Iraqê didome. Raya gel ya li Tirkiyê ji şer re amade dike. Pirsgirêkên navxweyî berovajî dike bi gotinên ‘’Tirkiye di bin xeteriyê de ye’’ ve dixwaze şer belav bike û ji bo dagirkeriyên nû bingeh ava bike.



## Doza PKK’ê dewam dike

**Farûk Sakik**

Tirk di sala 1071’an de, bi hevkariya Kurdan a şerê Milazgirê, ketin Anatoliya û împaratoriya xwe vakirin. Di sala 1919-1922’an bi şerê rizgariyê(kurtukuş) de bi hevkariya Kurda, komara Tirkiyê ya îro avakirin. Û îro dîsa dixwazin sînorên xwe(neo-osmanî) dorfireh bikin. Di pêşengtiya Erdogan de dixwazin sîstemek Îslamî avabikin. Erdogan dema di sala 2002’an de bû desthilatdar, di salên destpêka îktîdara xwe de, li gor Yekîtiya Ewrûpa û Amerîka ango hêzên ku ew anîbûn desthilatdariyê tevgeriya. Piştî demek roj bi roj sîstem guhert û li gor îdeolojiya xwe ya ‘Mîllî Goruş’ siyasetek pêşvexist.

Li Tirkiyê di civakê de guhertinên mezin çêbûn. Li Tirkiyê hin bajar anjî taxên mezin her wek bi sîstema şerîatê dijîn çêbûn. Lê Erdogan ev mîsyona xwe hên jî temam nekiriye. Ev sistem bi demê re wê li Tirkiyê bibe îktîdar. Li pêşiya wê hin asteng hebûn û diviyabû ku van astengiya ji holê rakira. Di destpêkê de dewleta-kûr an jî eskerî tasfiyekir. Dewletek-Kûr a li gorî xwe dîzayinkir. Ji bo pêşîgirtina midaxleyên hindurîn, hevalê xwe yê cîwantiyê, yê rêxistina “Mîllî Goruş” Îbrahîm Kalin, li îstixbaratê-MÎT bi cîh kir. Ji bo ku pêşîgirtina midaxleyên ji derve de wê werin jî, Hakan Fîdan(zilamê îstixbaratên derva) kir wezîrê karê derve.

Bi demê re dît hin tişt wek ku wî plankiriye birêve naçin. Di demek waha de dît ku bi siyaseta demokratîk ku Kurd jêre pêşengtî dike, desthilatdarî ji dest wan diçe(encamên hilbijartinên 31 Adarê). Bi têkçûna desthilatdariyê re wê were darizandin. Ya duduyan; Îsraîl li Rojhilata-Navîn ji nû de dîzayin dike û hebûna Tirkiyê tê wateya, Îrana duyemîn. Tirsa ku ewê Îsraîl berê xwe bide Tirkiyê li Erdogan peyda bûye. Dema ku Tirkiyê ev rastî dîtin, îroj pêdivî bi hevkariya Kurdan ya sêyem, wek hevkariya şerê Milazgir û şerê Rizgariyê dibîne.

Dema vê pêvajoyê dide destpêkirin bi nave PKK’ê tevgerek azadiyê derdikebe pêş wan. Di herdû serdemên berê de Kurd hatibû xapandin. Lê îroj xapandin li dera han, hêzeke ku ewê li ser navê Kurdan biryar bide heye. Di rojevê de mijara pêvajoyek nû tê kirin. Herkes ji 1’ê Cotmehê destpêdike. Herkes navekê nû lê dike. Pêvajoyek nû, pêvajoya aştiyê, çareseriya pirsgirêka Kurd, yekîtiya netewî û hwd. Mijar bi doza Kurdistan ve girêdayiye. Aşitî be, çareserî be her tişt bi PKK’ê ve girêdayiye.

Herkes çekdanîn an jî tasfîyekirina PKK’ê diaxive. Her wek her tişt destpêkiriye û li pêşiya wan bi tenê PKK’ê astengî ye. Lê hewldanên PKK û Rêber Apo yên çareseriyê û aşitiyê ji bîr dikin. Ji bo vê yekê divê berevajî bêçekirina PKK’ê, çareserkirina doza PKK’ê destpê bikin. Doza PKK’ê hên jî dewam dike. PKK’ê kiryarên sed salî ku dijî Kurdan hatibûn destpêkirin, komkujiyên ku hatibûn kirin, tunekirin û asîmlasyona Kurdan ji bona ku bide seknandin derketibû holê. Di vê têkoşînê de gelek bedelên mezin jî da. Gelek tişt bidestxistin. Îroj ji bo van destkeftiyan biparêze hebûna xwe didomîne. PKK’ê ev çend sale şer jî nakê ango li dijî dewletên dagirker operasyonan pêknaynê. Di pozisyona parastina xwe û Kurdistanê de ye. Dewleta Tirk dema pêngavekê bi vî rengî dide destpêkirin, tunekirina PKK’ê hedef digire. Divê Kurd neyên vê leyistikê û bi tenê bawerî bi biryarên tevgera azadiya Kurdistanê PKK’ê bînin. Ji bilî vê yekê axaftinên têne kirin hemû fîşene. Riya çareseriya pirsgirêkan di çareseriya doza PKK’ê de ye.